ji bo çi ev roj wisa buha ye

Dr.Memo Abdî

Eger em xwe bidin kûraniya dîrokê û di deryaya çand û rewşenbîriya dewlemend de avjeniyê bikin ,bê guman emê matmayî bimînin û nefretê li xwe û xebata xwe a bi navê rewşenbîrî ku tê nimandin bikin, çi diyarde an jî berhem bi fermanê ketina serhevdûve di dema dîrokî dirêj de xwe pêşdixe bedew dike him ji aliyê şêwaz û forma xwe ve û him jî ji aliyê naverok û astê nivîsandina xwe ve.

Lê di vir de zimanê me kine û em nikarin zêde rexne bikin. Ji ber ku hema di eynî kêliyê de wê bersiv amede be bi behaneyê ku em bindestin,û rê li ber çapemniyeke azad û pispor girtiye. Xem nake û ev jî sedemeke rewaye û di rê de ye ,lê katê em dîroka rojnamegeriya kurdî bişopînin e ku, mê rastî tiştne seyr û ecêb bên. Ji bo ev şîrovekirina me zelal be em armancdikin rojnamegeriya ya bi zimanê kurdî derdikeve û bi taybet bi zaravê kurmancî,ne tenê ev û bes û ciyê wê jî beşê biçûk ji Kurdistanê ye.

Ev sed û heft salin ku, tekoşîn berdewam dike,ji me tevan re diyare ku tu rojname û kovarên bi kurdî derdikevin ta niha forma xwe ya pêwîst li gor demê bê tune ye ,ji rojnameyê bêhtir belavok û broşûrên bi kurdî tên weşandin.

- Naverok û asta nivîszndinê pir jar û lawaze û di bêhtirîn nivîsarên xwe de berhevkirine yan nûçpkirina tiştê kevine
- Tu pisporî di wan de tuneye ,hema tevane yên ku dinivsînin yên tagir û hezkirê ziman û toreya kurdî ne.
- zimanê ku pê tê nivîsandin ji xwe ev bobelata mezine,hema dûrî tu rêzimana ye û pirî caran her nivîsarek bi rêzimanekê ye. Bi gotineke din encûmaneke sernivîsar ji kovarê yan belavokê re tune ye. Di vir de, bê guman yê ziman dizan xwe xilas dike lê yê nû fêr dibe diya wê tê gan ,hema ji rêzimanekî dikeve yekî din,nizane kî raste û kî şaşe.
- Ev hemî weşanên derdikevin, bêhtirê wana partgîrî ne yan jî alîgirê vê tevger û wê partiyê ne ,ev jî sedema herî giring e ku tiştê tê nivîsandin nayê xwendin yan jî balkêşe ji rêjeyeka pir hindik ji tagir û heyranên zimanê kurdî ve.
- Bi sedema ku, zimanê kurdî qedexeye li vî beşî, helbet wê nivîsandina pê astengan û dijwariyan bibîne. Lê qet me ji berpirsiyariyê azad nake û nayê wê watê ku hema hemî tişt bêrêz û pîvan be. Ji lewra, nivîsandina bi kurdî du aliyên wê hene
- Aliyekî pispor û rewşenbîrî ye û aliyê din zimanasiya, yanî kesê Ku belavokeka bi kurdî dixwîne, pêrgî du zehmetiyan tê:yek jê rewşenbîrî ye û ya din pirsgirêk û zimanê rêzimanî ne. Ta radeyekê ez dikarim biçespînim ku, armanc pirê xwendevanan ji xwendina gotareka bi kurdî bi mebesta fêrbûna zimanê kurdî ye ne ku mebesta wê ya ramanî û rewşenbîrî ye
- Ev hemî sedem û astengên me li jor nimandin me hişyar

D.R (6)